



Programa ji bo civak, xweza û ziman

Programa ji bo civak, xweza û ziman ji bo wan kesan e ku dixwazin zanibin ka civak çawa kar dike û tiştên ku li ser me însanan, xweza û ziman bandorê dike çi ne.

Divê bala te bixşîne ka însanên zemanên berê çawa jîyane û bandora wan ya li ser jîyana me ya îro çi ye.

Program ji bo wan kesan e ku dixwazin bêtir tişt li ser hevahengîya di navbera însan û xwezayê, pirsên jîngehê û pêşkeftina ragirbar de hîn bibin..

Herweha ziman û danûstendin ji beşeke girîng ya perwerdeyê ye.

Di programê de van tiştan hîn dibî

Tu di warê çawa meşandina civakê li Swêd û cihanê de bêtir tişt hîn dibî.

Tu hîn dibî ku li ser pirsên civakî, demokrasi û rolên cuda yên cinsan bifikirî û biraminî.

Tu hîn dibî ka însan di zemanên berê de çawa jîyan e û îro çawa dijîn.

Di programê de li ser ahengên di xwezayê de zanebûnan werdigirî û herweha hîn jî dibî ka însan tesîreke çawa li ser jîngehê dikin.

Her weha li ser pirsên cuda yên etîkî û pirsgerêkên jîngehê tu dê nîqaşan bikî û fikir biazîrî.

Bi rêya xwendin, guhdarîkirin û nîqaşa li ser wêjeyê tu zimanê xwe bi pêş ve dibî.

Tu dê nivîs û tekstên xwe binivîsinî.

Her weha kapasîteya xwe ya axaftina bi swêdî û inglîzî jî bi pêş ve bixî.

Program wiha hatiye amadekirin

Dersên hevpar yên dibistanên taybet yên lîseyê.

Di programên neteweyî de dersên ku herkes divê bixwîne hene. Ji vana re dibêjin dersên hevpar yên dibistanên taybet yên lîseyê.

Ev ders vana ne:

- Înglîzî
- xebata estetîkî
- dîrok
- spor û tenduristî
- matematîk
- xwezazanî
- olzanî
- civakzanî
- swêdî yan jî swêdî weke zimanê dûemîn.

Dersên hevpar yê programê

Di programê de dersên taybetmendî hene ku ji wan re dibêjin dersên hevpar yê programê. Hemû şagirdên Programa ji bo civak, xweza û ziman dê van dersan bixwîne:

- erdnîgarî (cografya)
- prodûksiyona medyayê
- xwezazanî
- civakzanî
- hejmarek kursên inglîzî û swêdî.

Pêdaketina hûrûkûr ya programê

Tu her weha çend dersên din jî dixwîni ku di beşa te hîlbijartîye de bêtir zanebûnan didê te. Ji vana re dibêjin pêdaketina hûrûkûr ya programê.

Ji ber ku dibistanên cuda di warê pêdaketina hûrûkûr ya programê de dersên cuda pêşwazî dikin tu dikarî bi xwe jî dibistana miraceatê wê dikî bipirsî ka li cem wan kîjan dersên pêdaketina hûrûkûr ya programê têne dayîn.

Her weha li ser webcîhê www.skolverket.se, di bin beşa Förskola och skola (Pêşdibistan û dibistan) dikarî bêtir li ser pêdaketina hûrûkûr ya programê bixwîni.

Hîlbijartina şexsî

Tu her weha hîlbijartîneke şexsî jî dikî. Tu dikarî çend dersên ku di programê de cih nagirin, lê ji aliyê hemû şagirdên li dibistanê ve dikarin werin xwendin, hîlbijêrî.

Pîlana dersan

Ji bo her dersek li Lîseyê perwerdeya taybetî pîlaneke dersan ya bi kursên pûankirî heye.

Heger tu serkeftî bî midûr dikare biryar bide ku tu kurs yan jî dersên li dibistana lîseyê bixwîni. Bi wî awayî pêşbirkexwazîya perwerdeya te zêdetir dibe.

Not û qarne

Dema kursek bi dawî bû tu jê not werdigiri. Mamoste dê zanebûnên te binirxîne û wan bi şertên di dereceyên notên A, C û E re miqayese bike.

Apl

Wan zanebûnên ku te li programê wergirtîne li kargehekê dikarî biceribîni û bikarbîni. Ji vê re dibêjin perwerdeya li cihê kar (arbetsplatsförlagt lärande, apl).

Xebata Lîseyaya perwerdeya taybetî

Bi armanca ku nîşan bidî tu ji bo wezîfeyên cuda yê xebatê baş amade yî tu de xebateke di Lîseyaya perwerdeya taybetî pêk bînî.

Ji ber ku divê xebata Lîseyaya perwerdeya taybetî temamiya perwerdeya te nîşan bide tu vê yekê di dawîya perwerdeya xwe de pêk tînî.

Pîlana perwerdeyê ya şexsî

Pîlaneke perwerdeyê ya şexsî ya te heye. Di wir de ew ders û kurs hatine rêzkirin ku tu dê di dema xwe ya lîseyê de bixwînî.

Hemû biryarên di derbarê ka tu dê çi bixwînî de pêwîst e di pîlana perwerdeyê ya şexsî de çîh bigirin.

Dîploma Lîseyaya perwerdeya taybetî

Dema tu piştî çar salan Lîseyaya perwerdeya taybetî bi dawî dikî ji te re dîplomayek tê dayîn. Di dîplomayê de ew zanebûn û tecrûbeyên te yê ji Lîseyaya perwerdeya taybetî hatine nivîsandin.

Ev dîploma nîşan dide ka te di nav çar salên xwe yê li Lîseyaya perwerdeya taybetî de çend pûan xwendine.

Heger te notên pejirandî ji kursên bi gîştî ji 2500 pûanî wergirtîye wê demê tu dibî xwediyê perwerdeyêke temamî ya dibistana lîseyaya taybet.

Di programê de wisa dixebitî

Di programê de tu bi awayên teorîk û pratîkî li ser pirsgerêkên cuda kar dikî, weke mînak pêkanîna ceribandîna û lêkolînên hêsan.

Tu kapasîteya xwe ya di warê nîqaşkirin û ramandina li ser pirsgerêkên civakî bi pêş ve dixî û test dikî.

Tu her weha têyî perwerdekirin ku di pirsên cuda de nêrîna xwe bibêjî.

Tu her weha temrînê dikî ka mirov çawa hevkarîyê dike û nêrînen xwe pêşkêş dike. Tu her weha bi awayêke serbixwe kar dikî û ders û wezîfeyên xwe pêk tînî.

Di warê karkirina serbixwe û girtina berpîrsîyarîyan de têyî temrînkirin.

Tu her weha diceribînî ji ku îzah bikî ka tu kar û xebata xwe çawa pêk tînî.